Australian Government

ParentsNext

Garantiya xizmetên ParentsNext'ê

Ev garantiya xizmetan, çaverêtiya dewleta Awstralyayê ji raberkerên ParentsNext'ê di dema raberkirina xizmetên ParentsNext'ê ji te ra radigihîne. Ev garantî, asta herîkêm a xizmetên çaverêkirî ya wergirtî, her wiha şert û mercên ku divê di dema amadebûna jibo karkirinê dabîn bikî, diyar dike.

ParentsNext pişta dêbav û çavdêran digire da ku dema ku zarokê wan ê biçûk perwerdehiya xwe li dibistanê dest pê dike, jibo kar bên amadekirin. Dewlet ParentsNext'ê bi riya şebekeyeka neteweyî ya raberkeran raber dike.

Raberkera te:

- alîkariya te dike da ku xalên xwe yên hêzê û her pirsgirêka ku jibo karkirina di pêşerojê da li pêşberî te heye, nas bikî.
- alîkariya te dike ku armancên xwe yên perwerdehî û karî nas bikî û riyekê jibo bidestxistina wan bibînî.
- hevkariya te dike ku planeke beşdariyê pêk bînî, ku pêwîstiyên beşdariya ParentsNext'a te diyar dike.
- te bi çalakî û xizmetên li civaka xwe wek mînak kursên fêrkirinê, şêwirîna fêrkariyê, piştevaniya ne-profesiyonal û lêmiqatebûna ji zarok girêdide û lînk dike da ku alîkariya te bike ku jibo karkirinê amade bibî.
- jibo vekolandina armancên te, pêşketin û birojkirina plana te ya beşdariyê heke pêwîst bike, her sê mehan carekê dê tev te bikeve têkiliyê.
- heke tu jibo karkirinê amade yî, alîkariya te dike ku karekî peyda bikî û heke xwedan merc bî, dê bi alîkariya (subside) destmizd an alîkariya mesrefa cîbecîbûnê dê pişta te bigire.
- te han dide ku derbarê çawaniya raberkirina xizmetên ParentsNext'ê biaxivî.
- xizmetên diyarkirî di plana xizmetên wan raber dike.
- bi awayekî edlane, bi rêzdarî û bi şêwazekê ku xwedan hestiyariya çandî ye, bi te ra tevdigere.
- xizmetên wan li cihên guncan jibo zarokan raber dike da ku bikarî zarokên xwe jî di nobetên hevdîtinê da hevrê digel xwe bînî.

Jibo wergirtina lêzanînên zêdetir seredana vê adresê bike dese.gov.au/parentsnext

Tiştê ku ji te tê çaverêtîkirin

- her karê ku te pejirandiye di bernameya beşdariya xwe cih bînî, pêk bîne.
- di nobetên seredan û hevdîtina digel raberkerên xwe da beşdar bibe.
- hele nikarî beşdarî nobetên hevdêtin an çalakiya xwe bibî, di dema herî lez da tev raberkera xwe bikeve têkiliyê.
- heke rewşa te guherî, wek mînak guherîna navnîşanê an hejmara telefonê, mijarê ji raberkera xwe ra bibêje.
- bi raberkera xwe ra bi awayekî edlane, bi rêzdarî û bi şêwazekê ku xwedan hestiyariya çandî ye, tevbigere.

Heke van pêwîstiyan dabîn nekî, renge dayîna bo te were rawestandin.

GIRÎNG

Lêzanînên te yên kesane ji aliyê Qanûnê, ji wan *Qanûna Jiyana kesane ya 1988an* va wek nihênî tên parastin. Raberkera te tenê wan babetan derbarê te radigihîne raberkerên xizmetan ku têkildarî beşdariya te li ParentsNext'ê ne.

Heke hewce be, raberkera te renge lêzanînan tev rêxistinên din ên dewletî parve bike da ku piştrast bibe ku ji asta guncan a piştgiriyê sûdê werdigirî.

Tu dikarî daxwaz bikî ku her cûre lêzanînên ku derbarê te li ber destê raberkera te ne, bi dest bixî û heke pêwîst bike wan sererast bikî.

Nêrîn, pêşniyar an Gilî

Nêrîna te derbarê xizmetên ku werdigirî, girîng e.

Heke tu difikirî ku alîkariyeka durust wernagirî, tev raberkera xwe biaxive. Raberkera te pêvajoyeka fîdbekê ya dadmendane û edlane raber dike û hewil dide ku nîgeraniyên te çareser bike. Heke tu hest dikî ku nikarî tev raberkera xwe biaxivî. Bi hêla telefona neteweyî ya xizmetên mişteriyan ra bikeve têkiliyê:

Bi riya telefonê:

1800 805 260 (Têkiliya ji telefona malê bêpere ye)

Bi riya Email'ê:

nationalcustomerserviceline@dese.gov.au

Heke nêrîneka te heye an dixwazî pêşniyarekê jibo baştirkirina xizmetên xwe yên ParentsNext'ê raber bikî, ji raberkera xwe ra bibêje an bi hêla telefona neteweyî ya xizmetên mişteriyan ra bikeve têkiliyê.

Jibo wergirtina lêzanînan derbarê dayînên piştevaniya ji derhata xwe bi hêla telefona Centrelink Families bi hejmara **136 150** ra bikeve têkiliyê an seredana vê adresê bike **servicesaustralia.gov.au**.

Jibo wergirtina lêzanînên zêdetir seredana vê adresê bike dese.gov.au/parentsnext